**JI BO GUHERÎNÊ BER BI AGAHIYA ÇALAKBAR VE: DÎYALOGA BI BAKUR Û ROJHILATA SÛRIYEYÊ RE**

# RAPORA PROJEYÊ 2025

**Emmaus Jokioinen**



# PÊŞGOTIN

Ew rapora projeyê di Berfranbara 2025an de hat nivîsandin. Di destpêka Rêbendana 2026an de, rêveberiya Îslamîst a Sûriyeyê êrîşî herêmên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilata Sûriyeyê kir. Dema ew pêşgotin tê nivîsandin, êrîş jî didome.
Li şûna hînkirin û lêkolînê, zanîngehên herêmê neçar man li dijî êrîşên çekdarî xwe biparêzin. Ji ber ku devera Reqayê niha di bin kontrola Îslamîst de ye, Zanîngeha El-Şerq a li Reqayê ya ku di vê raporê de tê behskirin neçar mabû karên xwe bisekinîne.
Lê belê, têkoşîna ji bo demokrasî, wekhevî û jîngehê didome. Hevkariya perwerdehiyê û piştgiriya hevber a zanistvanên Ewropa, Rojava û Başûrê Kurdistanê dê di siberojê de gelekî girîng bin.

26.01.2026
Koma projeyê ya Emmaus Jokioinenê

# NAVEROK


01 Beşdarvanên projeyê

02 Agahiya ji bo guherînê

03 Diyalog

04 Pisporiya bi rêya hevkariyê

05 Bihêzbûna bi zanistên sepandî re

06 Têkîliyên din

07 Hînbûna ji beşdarbûnê

08 09 Têkilî û hevbandorî

10 Proje didome

11 Bi me re têkilî dayîne

# BEŞDARVANÊN PROJEYÊ

**Ji bo guherînê ber bi agahiya çalakbar ve: diyolaga bi Bakur û Rojhilata Sûriyeyê re** projeyeke perwerdehiyê ye û bi hevkariya Enstîtûya Zanist û Teknolojiya Nûjen a Zanîngeha Rojava û Akademiya Polîteknîk a Tîgrîsê re ji hêla saziya fînî Emmaus Jokioinen ve tê birêvebirin. Di sala 2025an de, projeyê piştgiriya **Maj and Tor Nessling Foundation** standiye.

**Emmaus Jokioinen** saziyeke civakî û serbixwe ye û bi dehan salan e li seranserî dinyayê, bi alîkariya bazara xwe ya berhemên kevn, ji bo wekhevî û cihêrengiyê dixebite. Di salên dawîn de, saziyê bala xwe daye şoreşa Bakur û Rojhilata Sûriyeyê, wekî Rojava tê zanîn, û hewldanên wê yên ji bo demokrasiya beşdarker, wekheviya zayendî û ahenga jîngeh û civakê. Ew projeya demdirêj a ku sala berê bi pêş ve çûye, di navenda çalakiyên Emmaus Jokioinenê de ye.

**Zanîngeha Rojava** yek ji sê zanîngehên girêdayî Rêveberiya Xwesar a Bakur û Rojhilata Sûriyeyê ye. Armanca wê ji bo civaka azad, wekî çavkaniya jîndariyê, belavkirin û afirandina agahiya zanistî ye. Enstîtûya Zanist û Teknolojiya Nûjen a zanîngehê yek ji beşdarvanên sereke yên vê projeyê ye û li ser hînkirina zanistên xwezayî û teknolojiyê hûr dibe. Di nav salekê de, enstîtûyê ji zanistvanên xwezayî û endezyarên fînî alîkarî standiye.

**Akademiya Polîteknîka Tigrîs** saziyeke nû ya perwerdehiyê ye. Ew parçeya pergala perwerdehiyê ya Rêveberiya Xwesar a Bakur û Rojhilata Sûriyeyê ye. Çalakiyên wê bi hevkariya nêzik a piştgir û beşdarvanên fînî yên projeyê re tên plankirin. Akademiya polîteknîk li gel hînkirina nirxbilind a qadên teknîkî û hawirên ilhambexş ên hînbûna dijîtal, li ser demokrasiya zanîngehê, fikîrîna rexnegir û bandora civakî û berpirsyariya ekolojîk a endezyaran hûr dibe.

# AGAHIYA JI BO GUHERÎNÊ



## Armanca vê Projeyê

Bingeha ***Ji bo guherînê ber bi agahiya çalakbar ve: diyolaga bi Bakur û Rojhilata Sûriyeyê re*** ji bo lezandina guhartinên domdariyê, daxwaza berhevkirina agahiya zanistî, şiyanên endezyariyê û ramana jîngehî ya şoreşger e.
Armanc vekirina rêyên nû yên diyolaga Fînlandiya û Rojava – Bakur û Rojhilata Sûriyeyê ya ku bi îdeolojiya xwe ya civakî û jîngehî ya bêhempa re navdar e. Bi rêya diyalogê, gelê Rojavayê dikare piştgiriya pêwîst a ji bo perwerdehiya zanist û teknolojiyê bi dest bixe û fînî jî dikarin di mijara domdariyê de alîkariyê bistînin.

## Armancên sala 2025an

- Sazkirina xeteke ewle: Li cîrana Rojavayê, Başûrê Kurdistanê, vekirina bûroyeke Emmaus Jokioinenê û dîtina karkereke herêmî.
- Li Rojavayê, ji bo lihevhatina li ser rêyên hevkariyê, hevdîtina bi aktorên zanist û jîngehî û nûnerên rêveberiyê re.
- Belavkirina agahiyên li ser projeyê, dîtina dildarên nû, sazkirina civînên di navbera zanistvan û aktîvîstên fînî û rojavayî de.
- Plankirin û destpêkirina hevkariya domdar a beşdarvanên projeyê.

# DIYALOG

Di Sibata 2025an de, li Hewlêrê, Başûrê Kurdistanê, bûroyeke Emmaus Jokioinenê hat vekirin û ji hêla karmendekî jêhatî û herêmî ve tê birêvebirin. Civîneke bi hevkarên rojavayî re dikare were sazkirin. Di nîsanê de, nûnerên Emmausê bi giştî bist rojan, wekî mêvanên Zanîngeha Rojava û Akademiya Polîteknîka Tigrîs li Qamişlo û Hesekê man. Her wiha, nûner çûn serdana zanîngehên li Reqa û Kobanê, Lijneya Aborî û Çandiniyê û saziya hawirparêz Keziyên Kesk.

Civînan zelal kir ku beşdarvanên sereke yên projeyê li Rojavayê dikarin Enstîtûya Zanist û Teknolojî ya Nûjen a Zanîngeha Rojava û Akademiya Polîteknîka Tigrîs bin. Di dema serdanê de, di navbera wan saziyên perwerdehiyê û piştgirên akademîk ên fînî yên projeyê de nîqaşên vîdeoyî hatin pêkanîn. Koma projeyê ya Emmaus Jokioinenê ya li Fînlandiyayê, ji bo dîtina pisporên pêwîst ên ji bo hevkaran û li ser fersendên alîkariya beramber û hînbûnê yên projeyê, ji bo agahdarkirina aktîvîstan hatiye sazkirin. Hat dîtin ku di destpêkê de sazkirina beşdarbûna zanistvanên xwezayî û endezyarên têkildar dijwar e, lewma dilxwazên Emmaus di dawiya salê de ji Rojavayê re du sefer pêk anîn û bi awayekî ciddî, avakirina rêyên hevkariyê dest pê kir.



# PISPORIYA BI RÊYA HEVKARIYÊ




## Lêgerîna alîkariya hevber, nirxandin û şêwîrmendiya tezê

Derçûyiyên lîsansa bilind û doktorayê yên Enstîtûya Zanist û Teknolojiya Nûjen a Zanîngeha Rojavayê, hem wekî lêkolîner û hem wekî mamosteyan, li herêmê di avakirina demokrasiyê û têkoşîna li dijî karesatên jîngehî de roleke girîng dilîzin. Ji enstîtûyê re, li gel programên perwerdehiyê yên nûjen û girîng ên wekî programên lîsansa bilind ên hişê çêkirî, geoînformatîk û farmakolojiyê, li ser lêkolînên teknolojiya çandiniyê jî, ji bo bipêşxistina pisporiya akademîk, alîkariya navneteweyî pêwîst e. Enstîtû zanistvanên xwezayî vedixwîne ku ew wekî mamoste (ji dûr ve yan jî rûbirû), rexnegirên meqaleyên akademîk yan jî hev-şêwîrmendên tezê beşdarî projeyê bibin. Pêşniyarên li ser sêwirandina programên lîsansê jî bi kêfxweşî tên pejirandin. Armanc xurtkirina agahî û pisporiya Zanîngeha Rojava û gelê herêmî ye da ku guhartinên domdariyê bi rêya amûrên li ser bingeha îdeolojiya azadiyê werin pêkanîn. Her wiha, profesorên enstîtûyê dixwazin ku li ser mijarên wekî jîngeh, demokrasî û şoreşê, bi ewropayiyan re beşdarî nîqaşên polîtîk bin û ji hev re ramanan bidin û bistînin.
Zanîngeha Rojava bi zanistvanên civakî û mirovî yên ewropayî re xwedî gelek hevkariyan e lê di qada zanistên xwezayî û teknolojiyê de avakirina têkiliyan dijwar bû. Lewma, Emmaus Jokioinen bi taybetî hewl dide pisporên wan qadan bibîne lê em her kesî vedixwînin ku beşdarî nîqaşan bibin.

# BIHÊZBÛNA BI ZANISTÊN SEPANDÎ RE

## Sazkirina Kolektîf

Akademiya Polîteknîka Tigrîs li Rojavayê, dê di Tebaxa 2026an de were vekirin. Rêveberî û mamosteyên akademiyê dixwazin bi Emmaus Jokioinen û pisporên projeyê re damezrandina enstîtûyê û sala wê ya yekem saz bikin û tetbîq bikin. Di sala 2025an de, mifredat û rêbazên hînkirina dijîtal ên Tîgrîsê bi rêya hevkariyê hatin amadekirin. Sala akademîk a yekem dê bi kurdî were hînkirin û li ser şiyanên sereke yên endezyariyê, şiyanên xwendinê û zimanê îngîlîzî hûr bibe. Ji ber ku li Rojavayê pisporiya endezyariyê kêm e, di sê salên akademîk ên pêşiya me de ji bo qadên pisporiyê, ji derveyî welêt mamoste (perwerdehiya ji dûr ve) dê werin dîtin. Platforma Moodle ji bo hînkirinê dê were bikaranîn.




## Hevkarî dest pê dike

Di programên lîsansê yên akademiyê de endezyariya elektrîk û elektronîk, telekomunîkasyon, endezyariya makîneyê û teknolojiya agahî û komunîkasyonê hene. Em ji bo salên were, di tevaya wan qadan de, ji bo dersên pisporiyê li mamosteyên perwerdehiya ji dûr ve digerin. Ji bo bidestxistina pêwîstiyên heyî – şêwirmendiya pedagojiya dijîtal, avakirina mifredatê – me bi hin pisporan re têkilî danî û niha li dildaran digerin û hevkariyê saz dikin. Her wiha, Koma Tîgrîsê kesên eleqedar vedixwîne ku ew beşdarî nîqaşên li ser mijarên demokrasiya perwerdehiyê, rola civakî û berpirsyariya jîngehî ya endezyaran bibin.

# TÊKÎLIYÊN DIN



## Zanîngeha El-Şerq

Reqa

Nûnerên Emmaus Jokioinenê derfet dîtiye ku herin Reqa û Zanîngeha El-Şerq. Reqa yê ku di sala 2017an de ji destê DAIŞê hatibû azadkirin û zanîngeha wê ya ku di sala 2021an de hatibû damezrandin, coşa avakirina civaka azad û çalakiya li ser bingeha zanistê pêşkêş dikirin. Niha pêwîstiya zanîngehê bi piştgiriya navneteweyî re heye, wekî mînak, ji bo avakirin, domkirin û berfirehkirina pirtûkxaneya dijîtal.



## Zanîngeha Kobanê

Kobanê

Dema di sala 2015an de hêzên kurdan li wir DAIŞ têk bir, Kobanê li seranserî dinyayê bûye sembola azadî û berxwedana Rojavayê. Bajêr zanîngeha xwe di sala 2017an de bi dest xist. Nûnerên Emmausê çûn serdana yek ji kampûsên zanîngehê.
Nîqaş li ser pêwîstiya hevkariya navneteweyî, bi taybetî di qada perwerdehiyê de, hûr bûn. Têkiliyên pisporên teknolojiya ziman û wergerê jî tên xwestin.

## Desteya Aborî û Çandiniyê

Em ji bo nîqaşa li ser ramanên wan ên li ser pirsgirêkên jîngehî yên herêmê, çareseriyên gengaz û pêwîstiya ji bo hevkariya lêkolînê ya navneteweyî çûn serdana hevserokên Desteya Aborî û Çandiniyê ya Rêveberiya Xweser. Li gor wan, tiştê sereke avakirina afirandina domdar a enerjiyê ye. Di vê qadê de alîkariyên pisporên biyanî gelekî girîng in.

## Saziya Hawirparêz Keziyên Kesk

Bi salan e, Keziyên Kesk li Rojavayê beşdarî xebatên perwerdehî û bilindkirina hişmendiya jîngehî dibe. Ew çalakiyên çandina daran saz dikin û hewl didin bi rêya agahiyên zanistî, parastina pratîk a jingehî pêk bînin. Em çûn serdana ofîsa saziyê ya li Qamişloyê. Keziyên Kesk ji bo bidestxistina piştgiriya hevber û bilindkirina xûyabûnê, dixwaze bi saziyên hawirparêz ên sereke yên ewropî û navneteweyî re têkiliyê dayîne.

# HÎNBÛNA JI BEŞDARBÛNÊ



## Demokrasiya beşdarker di perwerdehiyê de (qadên zanista xwezayî û teknolojiyê tê de) prensîpeke rêber e.

Saziyên perwerdehiya bilind ên Bakur û Rojhilata Sûriyeyê hewl didin piştgiriya armancên şoreşa Rojava bikin. Lewma, rêbazên wan ên hînbûn, çanda wan a xebatê û hawirdora wan li aliyekî girîngiyê dide çalakiya siyasî ya her kesî û li aliyê din, girîngiyê dide berspiryarî ya kolektîf a civakî û jîngehî. Ji ber ku demokrasiya beşdarker a civaka Rojavayê di azadî û civakê de girîngiya bipêşketina takekesî nîşan dide, saziyên perwerdehiyê xwe ji şêwazên otorîter ên hînkirin û hînbûnê yên rejîma berê dûr dixin. Tevaya zanîngeh, dibistanên pîşeyî û dibistanên amadeyî yên Rêveberiya Xweser xebatên jinan û jîneolojiyê yên ku ji hêla tevgara azadî ya kurd ve hatin bipêşxistin û analîza siyasî ya ku li ser bingeha felsefeya Abdullah Öcalan e, di programên xwe de bi cih dikin. Li gel demokrasî û wekheviya zayendî, di nav armancên sereke yên rêveberiya xweser a Rojavayê de, bi piştgiriya saziyên perwerdehiya bilind, afirandina hevsengiya bi jîngehê re jî heye. Divê tevaya xwendekar, lêkolîner û pisporan beşdarî pêvajoyên bidestxistina wan armancan bin. Fînlandiya jî dikare ji vê şêwaza beşdarker hîn bibe.

# TÊKILÎ Û HEVBANDOR

## Çalakiya Agahiyê ya 16ê Mijdarê, 2025




Yekemîn çalakiya agahî û nîqaşê ya projeyê li Helsînkiyê, di Pirtûkxaneya Töölöyê de hat pêkanîn. Armanca çalakiyê gihiştina girseyeke berfireh bû, bi taybetî ji aktîvîstên jîngehî û civakî. Li gel nûnerên Zanîngeha Rojava û saziya hevpar a akademiyên polîteknîk, ji Bakur û Rojhilata Sûriyeyê saziya hawirparêz Keziyên Kesk jî axaftina xwe pêşkêş kir. Salon hema hema bi temamî tijî bû. Li gor şiroveyên beşdarvanan, axaftin balkêş bûn û derdoreke xweş hebû.

## Çalakiya Agahiyê ya 25ê Mijdarê, 2025




Duyemîn çalakiya agahiyê di Zanîngeha Helsînkiyê de, di avahiya Minervayê ya Fakûlteya Zanistên Perwerdehiyê de hat pêkanîn. Çalakî bi taybetî ji bo pedagog û zanistvanên xwezayî bû. Pêşkêşiyên nûnerên Enstîtûya Zanist û Teknolojiya Nûjen a Zanîngeha Rojava û Akademiya Polîteknîka Tigrîs nîqaşên şên û zindî afirandin. Gelek akademîsyen xwestekên xwe yên ji bo bihîstina agahiyên zêdetir ên der barê projeyê de anîn ziman. Têkiliyên nû hatin danîn û têkiliyên berê hatin xurtkirin.

## Meqaleya ku di kovara Ny tid de hat weşandin





Kovara bi zimanê swêdî Ny tid di hejmara xwe ya 10/2025an de li ser Zanîngeha Rojava meqaleyek weşand. Bingeha meqaleyê wêne û hevpeyvînan e ku di nîsanê de li Rojavayê di dema sefera projeyê de hatin amadekirin. Beşdarvanên hevpeyvînan mamosteyên zanistên xwezayî û teknolojiyê yên Zanîngeha Rojava bûn. Notên dawî yên meqaleyê hem behsa projeya Emmaus Jokioinen û hem jî piştgiriya Maj and Tor Nessling Foundation dike. Li Fînlandiya û Swêdê gelek xwînerên kovara Ny tid, bi taybetî jî versiyona wê ya dijîtal hene.

# TÊKILÎ Û HEVBANDORÎ


## Malper

Malpera *Ji bo guherînê ber bi agahiya çalakbar ve: diyolaga bi Bakur û Rojhilata Sûriyeyê re* di destpêka 2025an de, bi zimanê fînî û îngîlîzî hatiye vekirin. Di nav wê salê de, versiyonên bi zimanê swêdî, kurmancî, erebî û soranî jî hatin amadekirin. Di malperê de blogeke bi îngîlîzî heye û tê de hevpeyvînên ji Rojavayê û agahiyên li ser çalakiyên projeyê hene. Blog dê karê xwe di sala 2026an de jî bidomîne.




## Medyaya Civakî

Rûpela Instagramê ya projeyê bi taybetî di Nîsana 2025an de, di dema sefera Emmaus Jokioinenê ya li Rojavayê de çalak bû û çîrokên kurt û wêneyên ji Bakur û Rojhilata Sûriyeyê di vê rûpelê de hatin weşandin. Piştî re, medyaya civakî ji bo ragihandina çalakiyên agahiyê yên projeyê û nivîsên malpera blogê hatin bikaranîn. Ji ber ku proje di sala 2026an de jî didome, naverokên cuda dê werin zêdekirin.




## Broşûr û Kartvîzît

Ji bo amadekirina reklamên têkildarî çalakiyên agahiyê yên projeyê, xêzkereke grafîkê hatiye dîtin. Destkariya xêzkerê dikare di broşûra projeyê de were dîtin. Nivîs proje û derfetên beşdarbûnê bi awayekî zelal pênase dikin ku ew agahî di siberojê de jî dikarin were bikaranîn. Broşûr û kartvîzîta projeyê hem di çalakiyên me de hem di çalakiyên cuda yên li Helsînkî, Turku û Tampereyê de hatin belavkirin.



# PROJE DIDOME

*Ji bo guherînê ber bi agahiya çalakbar ve: diyolaga bi Bakur û Rojhilata Sûriyeyê re* projeyeke demdirêj e ku armanca wê di navbera pisporên li Fînlandiyayê dixebitin û zanîngehên Rojavayê de avakirina têkiliyeke mayinde ye. Hin mamosteyên zanîngehê bi endamên Emmaus Jokioinen re li Başûrê Kurdistanê civiyan û ew jî dixwazin alîkariya hevpîşeyên xwe yên li Rojavayê bikin. Em niha li ser afirandina platformên dijîtal dixebitin da ku kesên dixwazin beşdarî projeyê bin, bi hêsanî rêyekê bibînin. Em ê dîtina pisporên wekî mamosteyên xwecih û ji dûr ve, hev-şêwîrmend, rexnegir û mentor ên ku ji hêla hevkarên projeyê ve werin xwestin, bidomînin. Ji bo pêşkêşkirina hevkariya sîstematîk, divê Emmaus Jokioinen jî agahiyên xwe yên li ser çanda xebat û civaka Rojavayê bi pêş ve bixe. Lewma, em ê têkiliyên xwe yên bi beşdarvanên projeyê re zêdetir bikin û serdanên xwe yên li herêmê bidomînin.




## Plan

Koma projeyê ya Emmaus Jokioinen dê ji bo ragihandina li ser projeyê û di karên guncan de bicihkirina dilxwazên nû, xwe bi awayekî zelaltir birêxistin bike. Di vê mijarê de Akademiya Polîteknîka Tigrîs û Enstîtûya Zanist û Teknolojiya Nûjen jî dê roleke girîng bilîzin û birêveberê projeyê dê bi wan re têkiliya xwe her tim bidomîne. Em dixwazin bi zanîngehên zanistên sepandî û teknîkî yên fînî re hevkariyekê ya ku ji her aliyê re bikêrhatî ye ava bikin. Di sala 2026an de, çalakiyên agahiyê dê herî kêm li Turku û Espooyê werin sazkirin.

## Perspektîv

Em li ser hevkariya perwerdehiyê û armanc û bandorên wê pêşî ji perspektîva lezandina guhartinên domdariyê hûr dibin. Lê belê, li Fînlandiyayê nîqaşên ku ji hêla projeyê ve hatin destpêkirin perspektîveke din a girîng pêşkêş kir: demokrasiya beşdarker di saziyên perwerdehiya bilind ên Rojavayê û têkiliyên wan ên bi rêveberiyê re de çawa tê tetbîqkirin? Em dikarin li Fînlandiyayê ya ku li wê azadiya akademîk her ku diçe teng dibe, ji saziyên perwerdehiya bilind ên Rojavayê alîkariyeke çawa bistînin? Ew mijar dê di sala 2026an de werin nîqaşkirin.

# BI ME RE TÊKILÎ DAYÎNE



**Telefon**

+358 3 438 64 57

**Email**

emmaus@systemli.org

**Malper**

dialogueforchange.fi

**Navnîşan**

Humppilantie 339, Jokioinen